

Ziman

Em taybetmendiyan zimanê xwe binasin ku Bikaribin lê xwedî derkevin

BEŞA ÇAREMÎN

HESEN HUSEYİN DENİZ

((DENG BI YEKBÛNÊ WATEDAR DIBIN))

Her Dengê di alfabe yê de cih digre bi tenê serê xwe nikare wateyekê bide. Di zimanê kurdî de tenê dengê `Ê` û dengê `Û` dikarin bi tena serê xwe wateyekê bidin, lê dengên din tev ji bo watedayîne pêdiviyê bi alîkariya dengên din dibînin. Ger mirov bi awayekî rasthatinî dangan bîne cem hev an komî ser hev bike, dîsa wateyê berçav dernakeve holê. Ji bo vê di her zimanekî de rêzik û prensîbên sazûn û avabûna wî zimanî hene. Divê deng jî li gorî van rêzik û prensîban werin cem hev Deng bi ser hev vedibin û rêzedengan pêk tînin. Rêzedenga tewra biçûk `Kîte` ye. Ji kîteyan `Peyv`, ji peyvên jî hevok pêk tên Ji bo pêkanîna kîte, peyv û hevokan divê di navbera dangan de yekbûnek were çêkirin. Ev jî divê yekbûneke wiha be ku bi hatina cem hev wateyekê derxîne holê.

Herçiqasî kîte bi tenê serê xwe ne pêwîst e wateyekê diyar bike jî. taybetmendiya zimanê kurdî heye ku gelek peyv tenê ji yek kîteyê pêk tên û ji bo wê kîteyê wiha erka peyv diyar dikin tev watedar in. Peyv ji xwe divê watedar be. Wê demê di yekbûna dangan de watedayîna ango alîkariya watedayîne grîng e. Wekî vê, divê deng bi hev re di nava hevsazî û herikînekê de bibin yek. Yekbûna dangan divê ne bi awayekî gincirî be. Tîpên dengdar û tîpên dengdêr divê wiha di nava hev de werin hûnandin ku bi watedayîne re herikîn û hevsaziyeke bi guh xweş were bihîstin û bi dev hêsan were gotin çêbikin. Rêka vê jî di yekbûna dangan a li gorî rêzik û prensîbên rêzimanî yê her zimanekî bi xwe re derbas dibe.

Mirov dengên zimanekî nikare li gorî rêzikên rêzimanî yê zimanekî di bîne cem hev. Ji ber ku zimanê kurdî derfeta vegotina azad nedîtiye, kesên di dibistanên zimanê biyanî de fêr bûne, dengên kurdî wekî dengên Erebî, Farisî, Tîrkî yan Îngilîzî, Elmanî û hwd. bikar tînin. Ji bo vê jî dibêjin qey bi kurdî diaxivin, lê di rastiyê de hevsaziya dengê derdixin ne kurdî ye û ji bo vê jî aliyê kurdekîguhda ve têgihîştineke tam çênabe.

Mînak:

Dengê 'V' û dengê 'W' li şûna hev bikar tînin. Peyva 'Av', wek 'Aw' dibêjin ku di rastiyê de yekbûna dengên 'Aw' di zimanê kurdî de ti wateyê nade. Li şûna 'Vexwim', dibêjin 'Wexwim' ku yekbûna dengên 'Wexwim' di zimanê kurdî de ti wateyê nade.

DI YEKBÛNA DENGAN DE ERKA 'KÎTE'YÊ

Yekbûna herî biçûk a dengan wekî 'Kîte' tê binavkirin. Kîte dibe ku bi tena serê xwe wateyekê diyar bike jî, neke jî. Ji dengekî, yan ji çend dengan dikare pêk were. Erka kîteyan ew e ku dema tîna cem hev, dikarin peyvan saz bikin.

Erka kîteyê di vegotinê de grîng e. Dema mirov diaxive, bi pêlêkirin an di ser re derbasbûna kîteyan, dikare hevsaziyê û wateyê bide peyvan. Lêdan an kirpandina li ser kîteyê ger ne di cih de were çêkirin, dikare wateya peyvê bide guhertin. Ji ber vê yekê divê di her peyvê de mirov kîteyên wê peyvê binase û bizanibe wan ji hev cuda bike. Di axaftinê de herçiqasî mirov peyvekê yeker û kîteyên wê bi hev ve dixwîne jî, di rastiyê de dengê her kîteyekê wekî komek ji dengan, cuda cuda derdikeve.

Mînak:

Peyva 'Serxwebûn' ji sê kîteyan pêk hatiye. Dema mirov dibêje 'serxwebûn', ev deng wekî komeke yeker ji dev dernakeve, tersê wê, wekî sê komên dengên cuda derdikeve: 'ser - xwe - bûn.'

Di her peyvê de kîteya tê kirpandin û di her kîteyê de jî tîpa tê kirpandin heye ku ev jî bi kêrî hevsazîkirina peyvê tê.

Mînak: Peyva 'Serxwebûn' dema wekî nav were bikaranîn mirov kîteya destpêkê, dema wekî lêker were bikaranîn mirov kîteya dawî didewisîne û wiha watedar dike.

Di zimanê kurdî de sazîkirina kîteyan ji tîpekê heta pênc tîpan dikare pêk were. Kîte bi yek tîpê be jî, bi du, sê, çar, pênc tîpan be jî, ji hev nayê parçekirin.

Ji xwe taybetmendiyeke kîteyê ew e ku yekbûna dengê herî biçûk ê nayê parçekirin e.

Dema mirov kîteyê parçe bike, li holê kîte namîne. Hinek kes li dawîya rêzên nivîsandinê peyvan ne li gor kîteyan, li gorî xelaseka kêleka pelê vediqetînin ku ev yek hevsaziya xwendinê xera dike û peyvê ji wateya wê dûr dixê. Ya baş ew e ku mirov peyvê li gor kîteyê veqetîne.

Mînak: peyva 'serxwebûn' ku em bixwazin veqetînin, em dikarin di du cihan tenê re veqetînin : 'ser - xwebûn' ango 'serxwe - bûn.' Lê mirov nikare wek 'serx - webûn', 'se - rxwebûn', 'serxw - ebûn', 'serxweb - ûn' ango 'serxwebû - n' veqetîne. Veqetandinên bi van awayan ne rast in.

Kîteyên bi tîpekê dest pê dikin, dikarin ji tîpeke **dengdêr** pêk werin, lê nikarin ji tîpeke **dengdar** pêk werin.

Du tîpên dengdêr di hundirê kîteyekê de nikarin bi hev re cih bigrîn, lê du tîpên dengdar dikarin bi hev re cih bigrin.

Di kîteyekê de dikare tîpeke dengdêr bi yek, du, sê, çar tîpên dengdar re li cem hev cih bigre.

Mînak:

Kîteya bi tîpekê:

Di zimanê kurdî de tîpa 'ê' û tîpa 'û' him kîte, him peyvên bi serê xwe wateyê didin in. Lê derveyî van jî tîpên dengdêr ên hene bi serê xwe dikarin bibin

kîteyek:

BiaxiveBi / a / xi / ve
 Diêşe Di / ê / şe
 Dîîne Di / î / ne

Ode O / de
 Umet U / met
 Ûtî Û / tî
 Iqênî I / qê / nî

Kîteya bi du tîpan:

Min ta / sek av ve/xwar. Av
 Dî / sa ba û ba / hoz ra / bû. Ba
 Sa li ber de / rî di / re / ye. Sa
 Ka di ka / dî / nê de ye. Ka
 Beran Be / ran
 Cîran Cî / ran
 Sêkuç Sê / kuç
 Sobe So / be
 Min dît ku ew pir re / ben e. Ku
 ŞûşeŞû / şe
 Bizin Bi / zin

Kîteya bi sê tîpan:

Çav li ça / van di / ke / ve. Çav
 Dêr Zah / fe / ran li Mêr / dî / nê ye. Dêr
 Ren / qê po / rê te zer e. Zer
 Sor ren / qê xwî / nê ye. Sor
 Min pir şin ji bo wî ki / şand. Şin
 Ev dar pût bû / ye. Pût
 Ew kun bi kun li mar ge / ri / ya. Kun
Bej / na vî zi / la / mî kin e. Kin

Kîteya bi çar tîpan:

Zer / deşt dest / di / rêj e. Dest
 Wî po / rê xwe kurt bi / ri / ye. Kurt
 Se / lik ji sê / van mişt kir. Mişt
 Ew keç bîst sa / lî ye. Bîst
 Mar dî / be post, lê ne / yar na / be dost. Dost
 Pûng li ber a / vê şin tê. Pûng
 Di ka / bên wî de qram ne / ma / bûn. Qram

Kîteya bi pênc tîpan:

Stran / bêj st / ra / nan di / bê / jin. Stran
 Li ez / man ge / lek stêrk he / ne. Stêrk
 Li Ga / ba / rê ge / lek şkeft he / ne. Şkeft
 Ar / tê / şê drefş hil da ye. Drefş

Wa / te / ya **stirh**, qloç e. Stirh

DENGÊN BI KÊRÎ KELIJANDINÊ TÊN

Zimanê kurdî zimanekî sivik û herikîni ye. Bi gincirbûn an giranbûnê napejirîne. Ji bo vê çend dengên kelijandinê bi kar tîne ku rê nede astengiyên di vî warî de . Kelijandin hilandina du peyvên dengdêr bi alîkariya tîpeke dengdar e.

Dema du tîpên dengdêr tîn cem hev, gotina wan zahmet dibe. Herçiqasî di zimanê kurdî de wekî rêzikeke bingehîn ê rêziman tî gotin ku divê du tîpên dengdêr neyên cem hev, lê dema paşgir tîn paş peyvvan, ji pêwîstî du dengdêr tîn cem hev. Di rewşên wiha de ji bo ev her du tîpên dengdêr ên hatine cem hev giraniyê li ser ziman çênekin, dengêkî (tîpeke) kelijandinê dikeve navbera wan û girêdaneke nermîn di navbera wan de çêdike, gotina wan sivik dike.

Mînak:

Derî Ê me

Derî ê me.

Deriyê me.

Ger mirov bêje, "Derî me" li ser ziman wê giran were. Lê ku mirov bêje, "Deriyê me we siviktir û herikîni were. Di vir de tîpa 'y' erka kelijandinê dileyize.

Tîpên (dengên) kelijandinê ev in:

Vala / Valaî / Valahî H

Çiya / Çiyaê / Çiyayê Y

Li şûna tîpa 'h' li ser hinek devikan tîpa 't' jî tî bikaranîn. Mînak: vala / valaî / valatî

Lêbelê ji nava van dengan erk û bikaranîna tîpa 'Y' ji yê din zêdetir e.

Wî derî bigre. / Wî deriyê bigre.

Tîpa kelijandinê dikeve navbera du dengdêran, lê di kişandina lêkeran de, dema pêşgir bi serê lêkerê ve vedibe û du dengdêr tîn cem hev, tîpa kelijandinê nikare bikeve navbera wan.

Mînak:

Ger em lêkera 'axaftin' li gor dema niha bikşînin, pêşgira dema niha 'di' ye.

Wê wekî 'dixivim' were kişandin, wekî 'diyaxivim' nabe.

Divê mirov tîpên kelijandinê tenê di navbera dengdêran de bi kar bîne. Ger peyvek bi dengdarekê bi dawî bibe û peyva bê bi degdêrekî dest pê bike, hacet nîne ku tîpeke kelijandinê were bikaranîn.

Mînak:

Dibistan / Dibistan **ya** bilind / Dibistana bilind

Peyva 'Dibistan' bi tîpeke dengdar bi dawî dibe. Ji bo vê hacet nîne ku dengê 'ya wêbûnê' wekî '**ya**' were nivîsandin, divê wekî '**a**' were nivîsandin. Ku mirov bêje 'Dibistan ya bilind' şaş e. Awayê rast 'Dibistan a bilind' e.